

## Dengên /o/, /u/ û /û/yê di kurdiyê da

HEWLÊR, 26/5 2014 — Xeletî û şaşiyên zimanî li Dihokê gehîştine radeyekê ko mirov dikare navê Enfala Zimanê Kurdî lê bike. Gelek caran şaşî di zimanî da diqewimin û ev tiştêkê xweriskî ye. Mirov jiber wê ko mirov in şaşiyên dikin. Hindek caran jiber nezaniyê mirov şaşiyên dikin, hindek caran jiber bêşiyaniyê. Lê tiştê ez têderdînim ew e ko li Dihokê bi zanayî şaşî dihên kirin. Dê bibêjim ka çima.

Hema berî deh-dazde salan dema ez jibo cara yekê vegerriyam başûrê Kurdistanê, yek ji tiştên ko gelek ez diêşandim şaşiyên çapê di kovar û rojname û kitêbên Kurdistanê da bûn. Şaşiyên çapê di kitêbên dibistanê da jî hebûn, kitêbên ko dibê hema ji destpêkê ve zaroyan fêrî bê-şaşî-nivîsînê bikin. Tiştêkê xweriskî ye ko min xem xwaribin.

Lê, şaşî tenê şaşî yê çapê jî nebûn. Gelek caran ew şaşî ji ber nebûna standard anko rênivîseka pîvankî bû. Jibo nimûne dibû ko di paragrafêkê da peyva "bûn"ê bi sê şêwazan hatiba nivîsîn: "Ew ji kar kefitbû", "Ehmed li gundî bu mamusta" û "Ew li ser astê Kurdistanê bo kesê yekê".

Yek ji wan tiştên ko nebûna şêwazekê pîvankî gelek pê ve diyar bû nivîsîna "waw"an bû. Min gelek caran di danûstandinên xwe di gel hevalên nivîskar û zimanivanên Dihokê da jî behsa vê arêşeyê kiribû. Yek ji wan kesan seydayê min, Fadilê Emerî, bû. Wê demê ew di kovara Metîne ya bihagiran da dixebitî. Min ji wî pirsî ka çima wan ew hemî şaşî di nivîsîna "waw"ê da dikirin û bersiva wî jî ew bû ko berpirsê wî di kovarê da pêniyasîn bi hebûna çend "waw"ekan di zimanê kurdî da nedikir. Min jî belaş bizav dikir ko wan şêwazê xwe guhartiba. Piştî demekê "pêniyasîna" bi hebûna çend "waw"ekan di kurdiyê da li Dihokê zêdetir bû. Tu dibêjî qay ew jî jiber zêdebûna binadora soraniyê li Dihokê bû. Lê li vê dawiyê zimanê televizyona Waarê ez dîsa êşandim ve û ev e ez dîsa dê behsa dengdêrên koma "waw"ê bikim.

Li destpêkê dibê bibêjim ko yek ji sedemên şaşiyên nivîsîna "waw"an di kurdiyê da dibe ko kêmasiyeka gewherîn ya rênivîs anko elîfbêtkên erebiyê be. Elîfbêtkên erebiyê di koka xwe da elîfbêtkêka dengdaranî ye, anko nîşanên serekî, bi gotineka dî, tîpên vê elîfbêtkê dengdar anko tîpên konsonant in. Di koka xwe da, dengdêr anko vowel bi rê ya jêr û boran anko nîşanên diyakirîtkî (fethe û demme û kesreyê) dihên diyarkirin ko hema di nivîsîna asayî da nahên nivîsîn. Ew nîşanên dengdêran (jêr û bor) tenê jibo deqa pîroz a Quranê û jibo kitêbên fêrkirinê yê jibo zaroyan dihên bikarînan. Her ji ber vê kêmasiya gewherîn, jibo hindek dengdaran û dengdêran çî nîşanên serbixwe nînin. "waw" yek ji wan e.

Lê di zimanê kurdî da, her wesa di zimanê erebî da jî, "waw" wekî dengdêr û wekî dengdar jî heye. Dengdêrên binemaleya "waw"ê, mixabin, ko ji yekê jî zêdetir in.

Di erebiyê da bil ji konsonant anko dengdara "waw"ê (wekî ko di peyva weswas "وسواس"ê da heye) du dengdêr jî hene. Dengdêreka "waw"ê dengdêra kurt e ko mixabin di erebiyê da bi du rengan dihêt nivîsîn. Ya dî jî dengdêreka dirêje ko ew jî bi du rengan dihêt nivîsîn.

Yek ji sedemên vê cidarengî ya nivîsîna dengdêran di erebiyê da, her wekî me got kêmasiyeka gewherîn û binetarî di elîfbêtkî wî zimanî da ye ko dengdêran bi tîpan nîşan nake. Sedema dî jî saloxeteka serekî ya zimanê erebî ye ko wekî zimanên kurdî û zimanên dî yên hindî-ewropayî peyvên li ser bingehê kelwaş anko morfemên kelwaşzanistî anko morfolojîk ava nake. Di zimanê erebî da, peyv li ser bingehê kelwaş anko morfemên dengzanistî anko fonemî dihên avakirin. Jibo mînak, hema bibêje hemî peyvên erebî yên xwerû erebî ji rehên sêkanî (sulastî) an çarkanî (rubastî) ne. Jibo mînak, sê dengên, /l/ (ل), /m/ (م) û eyn-ê (ع) dikarin bi çend rengan li ser hevdu kom bibin û peyvên mîna ilim (علم, zanîn), lemei (لمع, teyîsîn) û emel (عمل, karkirin) jê peyda bibin. Paşî, ereb van her sê peyvên bingehîn anko rehan dibin nav qalib anko wekî ew bi xwe dibêjin dergeh (bab) ên cidacda, û peyvên nû ji wan çê dikin. عمل, اعمال, استعمال, تعامل, تعميل, انعمال, ... عامل, عميل, متعامل, مستعمل, ... معمل

Di rehên sêkanî û çarkanî da tenê dengdar anko konsonant nînin. Hindek caran dengdêr anko vowel jî hene. Vêca, dema peyvên nû ji wan dengdêran dihên çêkirin ew dengdêr wekî nîşanên jêr û bor nahên nivîsîn. Ew jî wekî dengên dî yên wî zimanî bi tîpan dihên nivîsîn. Lewma em dibînin ko "waw" wekî dengdar û dengdêr hene. "ya" jî wesa ye. Jibo nimûne di wan peyvên da ko ji koka sêkanî ya "emel"ê (عمل) hatine avakirin hemî "waw" dengdêr in, wekî: emelû (عملوا), yeimelûn (يعملون), len yeimelû (لن يعملوا). Lê di wan peyvên da ko ji koka sêkanî ya "weheb"ê hatine avakirin, dibe ko "waw" wekî dengdêr û wekî dengdar hebin. Mînaka dengdara wê: Wehhab (وهاب), mînaka dengdêra wê mewhîbet (موهبة). Ko di koka xwe da dîsa her dengdar e lê di axivtinê da wekî dengdêr dihêt gotin (mûhîbe).

Bi wergirtina elîfbêtkî erebiyê jibo zimanekê mîna kurdîyê gelek alozî çê bûne. Piştî 90 salên xwîndin û nivîsîna fermî bi wî devokî, hêştî jî soranan şerrê wane ka peyvên wekî "welat"ê bi yek "waw"ê bihên nivîsîn an bi diwan. Lê ya ji wê giringtir, li Dihokê hêştî nizanin li kîderê "waw"ek (u, و) bihêt nivîsîn û li kû du "waw" (û, وو) û li kêrê jî "waw" a qelew anko ya heftek li ser (o, و).

Jibo wê ko behskirina li ser sedemên hebûna vê şaşiyê li Dihokê tivav û kemilan bibe, dibê piçekê bi paş ve vegerrim û behsa werara dengên "û", "o" û "û" yê di zimanê kurdî da bikim.

Bi rengê xwe yê heyî, dengên malbata "waw"ê di zimanê kurdî da ji hemî dengdêrên dî çendirengtir in. Ez dê bi kurtî behsa wan bikim.

Di pirranî ya peyvên kurdî yên nû da, nemaze di kurmanciyê da, bi hemî zar û bin-zarên xwe ve, dengê "waw" a kurt ya ko di elîfbêtkî latînî ya kurdiyê da bi nîşan anko tîpa "u"ê dihêt diyarkirin, gelek caran cihê xwe daye dengdêreka ji wê kurttir ko hema di elîfbêtkî erebî ya kurdiyê da çi tîp anko nîşan jibo wê nehatine diyarkirin. Di nivîsînên rêzimanî yên başûrê Kurdistanê da dibêjin vî dengî "bizroke" ko ji xwe şaş e. Ew deng bezir û hinda nîne, nîşan an tîpeka ko wê diyar bike bezir anko winda ye. Di elîfbêtkî latînî ya kurdiyê da tîpa "i"ê wî dengî diyar dike. Mînakên vê deng-guhartinê gelek in. Lê pirranî ya caran ew di peyvên çaxên navîn da dihêt dîtin. Peyvên mîna mus-hef (مصحف), mustefa (مصطفى), muşterî (مشتري), murîd (مرید), murad (مراد), musteîd (مستعيد) û bi sedan peyvên dî yên erebî di kurdiyê da dibin mis-hef, mistefa, mişterî, mirîd, miraz\mirad, misteîd,...

Lê li vê dawiyê jiber bandora serdestî ya zimanê dewletên dagîrkerên Îraq û Sûriyayê û jiber xurtbûna sirêmen dîndariya selefî û têkihlî erebiyetê, gelek ji kurdan êdî wesa hizir dikin ko îna navê Mistefayî gunehêka mezin e û dibê bibêjin Mustefa. Ev jibo hemî navên dî jî wesa ye. Berê kurdan digot Ebdila, paşî got Ebdila, niha gelek dibêjin Ebdullah.

Dengê "u"ê di hindek peyvên da ko ji kokên kevnartir yên zimanê kurdî jî hatine bûye "i".

Peyva avêstayî ya "muşke"ê di zimanê pehlevî da bûye "muşk", paşî di kurdiyê da bûye "misk". Ew peyv di farisiya nû da "moşk" û di soraniyê da "mîsk" e.

Peyva îraniya kevin ya "puçe"ê di zimanê pehlevî da bûye "pus" û "puser", di farisî ya çaxê navîn da bû "pos" (navê helbestvanekê kevin yê şîrazî Şemsê posê Nasirî bû) û "pêser", di farisî ya niha da "pêser" e. Di kurmanciyê da "pis" e (wekî di peyvên mîna "pismam" û "pismîr"ê da maye) û di soraniyê da her nemaye.

Peyva avêstayî ya "huşke"ê di zimanê pehlevî da bû "xuşk", di farisiyê da bûye "xoşk" û di kurmanciyê da "hişik" û di soraniyê da jî "hişk" an "wişk" e.

Lê hindek ji wan "u"yên avêstayî û îranî yên kevin hêştî jî di kurdiyê da wekî xwe mane:

Peyva avêstayî ya "hunere"ê di zimanê pehlevî da bû "huner", di farisiyê da bûye "honer" û di kurdiyê da jî "huner" e. Helbet di kurdiyê da rengê guhartî yê peyva hunerê heye ko raman û maneyeka nû wergirtiye. Kurd dibêjin "Ma xo ne hinêra te bû!" anko hinêr li vêderê bi ramana karekê gelek ecêb anko şahkar û masterpîs dihêt bikarînan. Jibo nimûne mirov dikare bibêje "Mem û Zîn hinêra Ehmedê Xanî ye".

Dengê "u"ê di hindek peyvên avêstayî da bi rengê dî werar kiriye. Li van mînakên binihêrin:

Peyva avêstayî ya "yuxte"ê di zimanê pehlevî da bû "yuxt", di farisiyê da bûye "cofit" û di kurmanciyê da "cot" û di soraniyê da jî "cût" e.

Çend dêrrekan li jortir, min got ko di çaxên navîn da dengê "u"ê di gelek peyvên ko hatine nav zimanê me da bûye dengê "i"ê. Çima ez dibêjim peyvên ko di çaxên navîn da hatine? Yek ji delîlên min jibo vê axivtinê ew e ko ew deng di hindêk peyvên avêstayî û pehlevî da bê guhartin derbazî kurdîya me ya niha bûne. Hindêk ji wan bûne "O", hindêk jî bûne "û". Lê ew deng di pirranî ya wan peyvên da ko di çaxên navîn da jibo nimûne ji zimanê erebî derbazî zimanê kurdî bûne, her wekî me li jor behs kir, bûye "i". Ev ne tenê jibo peyvên ji koka erebî qewmîye. Peyvên ko di çaxên navîn da jibo nimûne ji zimanê farisî an tirkî ya osmanî jî derbazî kurdiyê bûne her tûşî vê guhartinê bûne. Peyva "cift" (coreyekê tivengan ko du lûlîyên wê hene û fişekan dîkin ber û ji serî ra nahêt tijjekirin) nimûneyeka baş e. Ew peyv bi koka xwe ya farisî "coft" e ko kurdî ya hevberî wê "cot" e. Lê ew dengdêra farisî di kurdiyê da bûye "i" û peyva "cift"ê jê peyda bûye.

Guhartina dengên malbata "waw"ê di zimanê kurdî û zimanên dî yên binimalbata îranî da bi giştî weha ye.

Di farisî ya nûdem da dengê "u"ê hema her nemaye û dengê "o"ê bi giştî cihê wî girtiye. Jibo nimûne:

"muşk" a pehlevî bûye "moşk" a farisî, "huner" a pehlevî bûye "honer" a farisî, "muhemmed" a erebî jî bûye "mohammed" a farisî. Lewma pirranî ya "u"yên îranî yê kevin ko di kurmanciyê da wekî xwe mane, di farisiyê da bûne "o". Pirranî ya wan peyvên di soraniyê da wekî "u" mane.

Pirranî ya dengê "u"yên ko di çaxên navîn da derbazî kurdiyê bûne û di kurmanciyê da bûne "i" di soraniyê da an wekî xwe "u" mane an jî bûne "î". Nimûne yê van peyvên nemaze jibo peyvên ko ji zimanê erebî hatine zehf in. "ihitiyac" a kurmancî (ji erebî ya "احتياج") dibe "ihtiyac" a soranî, "extiyar" a kurmancî (ji erebî ya "axtyar") dibe "ixtiyar" a soranî, "izin" a kurmancî (ji erebî ya "إذن") dibe "îzin" a soranî. "İdrîs" a kurmancî (ji erebî ya "ادريس") dibe "îdrîs" a soranî.

Dengê "û"yê piçekê bi-teşqeletir e. Dengê "û"yê di pirranî ya peyvên îranî yê kevin da wekî xwe derbazî farisî ya nûdem bûye. Pirranî ya wan peyvên di soraniyê û di devokên derdorî yê kurmanciyê da jî her ew deng parastiye. Jibo nimûne peyvên "mû" di farisiyê da, di soraniyê da, di devokên derdora mêrdînê, serhedê û kurmancî ya kevnekomarên Sovyeta Berê û kurmancî ya nava Îranê û Xurasanê da wekhev dihêt gotin.

Lê her ev dengê "û"yê di nav kelhuran da, di nav loran da, di nav tatiyan da, û li herêmên Behdînan û Hekariyê wekî dîftongek dihêt gotin. Di nivîsînên berê yê de vera Behdînan da gelek caran ew dîftong anko pevdeng wekî "wî" (وی) dihat nivîsîn. Hindêk delîl li nik min hene ko dibêjin ev coreyê bilêvikirina pevdenganî anko dîftonganî ya dengê "û"yê ji coreyê berbelavtirê wê kevnartir e:

Di nav tevaya devokên navend û rojavayê Îranê da, heta berî serdestî ya farisî ya standard û belavbûna alavên nû yê mîna televizyon û radyoyê, ev coreyê bilêvikirinê serdest bû. Peyva tabo ya "کون" (bixwînî kûn) di farisiyê da hevberî

peyva kurdî ya "qûn"ê ye. Lê di devokê Qezwînê da heta niha jî "kwîn" dihêt gotin. Ew peyv di tatî, kelhurî, lorî, feyilî, û gelek deverên Behdînan û Hekariyê jî wekî "kwîn" an "qwîn" dihêt gotin. Peyvên wekî "mwî", "gwî", "bwîk",... jî weha ne.

Li pirranî ya deverên kurmançiyê ko dîftongê "wî" nemaye jî, ew dîftong di hindêk peyvan da her maye. Jibo nimûne li hindêk deverên kurmançan jî "xwîn"ê ra dibêjin "xûn", lê pirranî ya nîzîkî tevaya kurmançan dibêjin "xwîn". Hema di rênivîsa latînî ya ko li bakurê Kurdistanê jî li kare, peyva "xwîn"ê wekî "xwîn" dihêt nivîsîn.

Gelek peyvên ko di kurmançiya Behdînan da heta berî deh-bîst salan jî bi dengê "wî" dihatin bilêvikirin, hêdî hêdî ji ber bandora zimanên serdest yê mîna erebî û tirkîyê an jî jiber meylarî ya giştî ya zimanê kurdî bi xwe, wekî "û" dihên gotin. Jibo nimûne, heta demekê berî niha navê "Mehmûd" li pirranî ya deverên Behdînanê wekî "Mehmwîd" dihat gotin. "Mewlûd" û "Mesûd" jî weha bûn. Pîremêrên devera me li destpêka Şoreşa Gulanê navê serok Barzanî wekî "Meswîd" digot. Lê niha kesek weha nabêje. Dibêjî qay gotina navên erebî dibê bi tecwîda Quranê be.

Di soraniyê da jî ko bi giştî dengê "û"yê heye, di hindêk peyvên mîna "xwên"ê da mirov hest bi hebûna pevdeng anko dîftongekê (wê) dike. Mirov dikare wekî nimûne behsa peyvên "xwên" û "hengwên"ê di soraniyê da bike. Jibo vê diyardeyê devokê bajarê Koyê (Koy Sinceqê) ne wek herêmên dî yê soranan e. Koyî "xwên"ê wekî "xûn" bilêv dikin.

Bi giştî, pirranî ya dengên "û"yê di farisiyê, soraniyê û devokên derdorî yê kurmançiyê da wekhev in. Lê di feylî û kelhuriyê da, di lorî û tatiyê da, û di pirranî ya devokên navendî yê kurmançiyê da (Behdînan û Hekariyê) ew dengê "û"yê wekî "wî" an "û"ya elmanî dihêt bilêvikirin. Lê mixabin li Dihokê niha wê "wî"yê jî hema dikin "î". Jibo nimûne li Dihokê "rûbar" bûye "rîbar", "sûk" bûye "sîk", "bûk" bûye, "bîk",... Di nav gelek malbatên Dihokê da mirov dibîne ko bab û dayik dibêjin "bwîk" û zaro dibêjin "bîk". Ev jî nîşana wê ye ko ev diyarde diyardeyeka gelek nû ye. Ko ev şewazê bilêvikirinê tenê jibo axivtina rojaneya "paytextê Behdînanê" bimîne çî arêşeyan çê nake, lê ko Dihokî bixwazin zimanê xwe yê standard li ser vê bilêvikirina xwe ava bikin, dê xwe ji pirraniya kurmançên cîhanê vabivêrrin û dê arêşeyekê li ser arêşeyên heyî zêde bikin.

Dengê "O"yê her wekî min berî niha jî got di zimanê farisî da bi tivavî cihê dengê "u"yê girtiye û di farisiya standard da dengê "u" nemaye. Lê di kurdiyê da, dîsa, çawa ko me behsa dengê "û"yê kir, soranî û devokên derdorî yê kurmançiyê dişibhin hevdu û devokên navendî yê kurmançiyê di vê navberê da vavarto ne.

Tevaya dengên "o"yê soranî û devokên derdorî yê kurmançiyê di pirranî ya devokên Behdînan û Hekariyê da piçekê zêdetir dihên kêşan û hema bibêje wekî "û"yê soraniyê û devokên derdorî yê kurmançiyê dihên bilêvikirin. Jibo mînak peyva "çok"li hindêk deverên Behdînan û Hekariyê dibe ko wekî peyva "çûk" bigehe guhê Mêrdînî û Diyarbekiryan.

Encam:

Bi rengekê giştî, dengê "û"yê wekî ko di soraniyê û botaniyê da dihêt bilêvikirin, di pirranî ya deverên Hekarî û Behdînanê da dibin "wî". Meyldariyek li nik hindek ji xelkê Behdînanê, nemaze Dihokiyên, heye ko wî dengê hêşta bişkênin û wekî "î"yê bibêjin. Lê ko mirov bixwaze rênivîseka standard ava bike dibê birriyarê bide ko bi yek rengî binivîse, ne xem e ka çawa dixwîne. Berê, dema li salên 60an ji sed sala bîstê hindek ji nivîskarên Behdînanê, ji wan nivîskarên Dihokê jî, dest bi nivîsîna kurmanciyê kir, wan pevdeng anko diftongê ko di peyvên mîna "bûk"ê da hebû wekî "wî" dinivîsî. Jibo nimûne: Bwîk, zwî, dwîr, swîr, kwîr, rwîbar. Lê niha pirranî ya nivîskarên Dihokê wan peyvan wekî bîk, zî,, sîr, ... Dinivîsin. Ev jî xwe dûrikirinek e ji deverên dî yên kurmancan û xizmeta yekgirtina zimanê kurdî nake. Jiber ko pirranî ya wan peyvan di soraniyê da û di botaniyê da jî wekî bûk, zû, dûr,... Dihên nivîsîn.

Pirranî ya dengên "o" yên soraniyê û botaniyê li deverên Hekarî û Behdînanê gelek caran wekî "û"ya soranî û botaniyê bi ber guhan dikevin. Lewma jî min gelek kes ji nivîskarên xudan tecrîbeyên Behdînan jî dîtine ko li dema nivîsîna wan peyvên ko dengê "o"yê têda heye tûşî şaşiyê dibin.

Jibo dengê "u"yê gelek arêşe nînin.

Mirov dikare peyvan li goreyê devokê gundê xwe bilêv bike, lê bila awayê nivîsîna wan standard be. Hemî iniglîz dinivîsin "often" lê kêmek ji wan dixwînin /oftin/. Ew pirranî an dibêjin /afin/ an /ofin/. Bila em jî jibo nivîsîna kurdiyê tifaqekê bikîn.